

KOVARA

M




UZÎK



H

INER



CEJNA

NEUROZA WE

PÎROZ BE

HER BIJÎ NEUROZ HER BIJÎ MUZÎK HER BIJÎ EVÎN

NEMAN Û MIRIN BO DÎNÊ ÎSLAM Û VEGIRKERAN



Sal 2 Hejmar 3 Bihara 1981 - Neuroza pîroz 2593 k





HINERA FOLKLORÎ

Notenivis:-

Nûra Cewarî

Ermenistan

Helbesta

Melayê Cizîrî

Allegretto ♩ = 82

dil - be - ret min dî di xew - da,
 dil we - kî bed - ra se - feq - da,
 te ez ki - rim (i) dî - wan û sew - da,
 ka ge - lo der - man he - ye? te ez ki - rim
 (i) dî - wan û sew - da ka ge - lo der - man he - ye?

Dilberêk min dî di xew da
 Dil wekî bedra şefeq da
 Te ez kirim dîwan û sewda
 Ka gelo derman heye?

Dil wekî bedra hilal e
 Sûleye, husl û cemal e
 Nezerek bo min helal e
 Min diye fewta heye

Nezerek dî min hebîbê
 Sotime bi tîra reqîbê
 Wey li halê min xerîbê
 Rû reş im, şermende me

Rû reş im, dûr im ji babê
 Sotime mislê kebabê
 Ra li halê min qe nabê
 Emir û fermana te ye

Moderato ♩ = 70 Berde

The image shows a musical score for a song titled 'Berde'. It consists of five staves of music in a 2/4 time signature, marked 'Moderato' with a tempo of 70 beats per minute. The lyrics are written below the notes. The melody is simple and repetitive, using a mix of eighth and quarter notes. The lyrics are: 'Ber-de, ber-de, lo, ber-de, lo, ku-lo, des-tê min ber-de, ber-de, ber-de, lo, ber-de, lo, ku-lo, des-tê min ber-de, ha-vê-ne kul û der-de, lo la-wo des-tê min ber-de, lo, ber-de, ku-lo, des-tê min ber-de.'

Berde, berde lo, berde lo
Kulo, destê min berde
Berde, berde lo, berde lo
Kulo, destê min berde
Havîn e, kul û derde lo
Lawo destê min berde
Lo berde
Kulo, destê min berde

KOVARA MUZİK Û HINER EIXWÎNE Û BELAV BIKE!

Allegretto 1 = 78

Lorî

Er-ê, de lor, de lor,
lo-ri, lo-ri, (i) ez bê-zi-ka
xwe dihe jî-nim, e-ri lo-ri
lo-ri, lo-ri la-wo,
(i) xe-mê di-lê xwe dire-vî-nim,
(i) de lor, de lor, ber-xo de lor.

Erê de lor, de lor, lorî, lorî
Ez bêşika xwe dihejînim
Erê lorî, lorî, lorî lawo
Xemê dilê xwe direvînim
De lor, de lor, berxo de lor

HINERA NÛ

Notenivîs:- Beşir Botanî




Helbest: DÎK Û ROVÎ
Mamoste Osman Sebrî

Awaz:
Besîr Botanî



Dî-kek hebû qî-ro -sû Ra-bû li ser dî-wêr ve-nîst
Dîkek hebû qîros û xîst
Rabû li ser dîwêr venîst
Rovîkî jîr dîk dît li wir
Hat cem, silav jê ra dikir
Gotê:nînin mizgeft û dêr
Fermû were dane li jêr
Îro nimêj min nekir hêj
Bo min bibî tu pêşnimêj
Fêla rovî dîk bîr dibir
Zanî ko ew dê wî bigir
Gotê:nimêj hîn nebûye
Bi ser de min destmêj niye
Rovî digot:Ca were xar
Pir in li nik min text û dar
Façekî tu rakeve min
Li der mane zarok û jin
Ava bikin xanîkî çak
Bo te bibin gundekîpak



Kês hati bû dîkê qiros
 Rovî êxist feqê bi los
 Gotê: biliv li pişt dîwêr
 Kizîr bîne ez tême jêr
 Rovî berî da cem kizîr
 Lê herde bû tajikî pîr
 Da xwe bi lez û bez revî
 Çû cihekî bi rêl û devî
 Gava ko dîk halê wî dî,
 Şa bû dîkir qixî qiqî



MEHABAT



Rîz-gî - ni-yek va ye hat
 Pêş-mer - ge-me ha we lat
 Ha - tim ha - tim Me - ha - bat
 I - ro ro - jli me hî lat
 Ha - tim ha - tim Me - ha - bat
 Her bi jî ey pêş - mer - ge
 Tu yî ser - da - rê şo - res



MEHABAT

Helbest û awaz:-

Beşîr Botanî

Pêşmerge:—

Mizgîniyek va ye hat
Pêşmerge me bo welat
Îro roj li me hilat

Hatim hatim Mehabat
Hatim hatim Mehabat
Hatim hatim Mehabat

Gel:—

Her bijî ey pêşmerge
Tu yî serdarê şoreş

Pêşmerge:—

Bi sosyalîzm û demokrat
Bo rizgariya welat
Îro roj li me hilat

Hatim hatim Mehabat
Hatim hatim Mehabat
Hatim hatim Mehabat

Gel:—

Her bijî ey Pêşmerge
Tu yî serdarê şoreş

Pêşmerge:—

Ji Hemrîn ta Ararat
Rabin pêkve bo xebat
Îro roj li me hilat

Ji loristan ta Firat
Azadî nabe xelat
Hatim hatim Mehabat

Gel:—

Her bijî ey Pêşmerge
Tu yî serdarê şoreş

Helbest:

Awaz û deng:

Mamoste Sebrî Botanî

Mihemed Şêxo

Bê xe - ba-tû ka - ru bi zav
 Bê za - nî - nû re - jî - mû
 rav Na-bî xu - da - ne ma
 Na bi xu - da nê
 ma fû - nav

Bê xebat û kar û bizav
 Bê zanîn û rejîm û rav
 Nabî xudanê maf û nav

Ayîn ji bo te kirne dav
 Dagîr dîkin pê xak û av
 Her dimijîn hêz û dirav

Eger bimînî sist û xav
 Ev tarîstan nabe hetav
 Peyda dibe êşa zirav


Bo armancê, pêngav pêngav
 Bixebite ji dil hinav!
 Şareza be! Hebe sed çav!

Hatina Newrozê

Besir Botani

The musical score for "Hatina Newrozê" by Besir Botani is presented on ten staves. It begins with a treble clef, a key signature of one flat (B-flat), and a 2/4 time signature. The melody is primarily composed of eighth and sixteenth notes, often beamed together. The score includes two first endings (marked '1' and '2') on the fourth staff and two second endings (marked '1' and '2') on the tenth staff. The piece concludes with a double bar line and repeat dots.

PAŞXISTINA STRANA KURDÎ



Beşir Botanî

(Divê hinermendê zane hinera qelê xwe ji nemanê biparêze. Bi helbest û awaza stranê nelîze û neqûhire. Her wisan divê sêd ji hinera qelên pêsketî werbigre.) Lê pir mixabin, ku piraniya stranbêjên me yê ku li derveyê welat dijîn û hindek ji kurdên bajaran ji nezana xwe hinera kurdî pîs kirine û gelek paşxistine. Hema çî ji aliyê helbest, awaz û çî ji aliyê strandin de be. Her wisan divê mirov bizane, ku çawan kurdên Sovjetstanê, Botan, Badînan, Mûkriyan, Hewreman û Dawûde hinera xwe parastin û diparêzin?! Çawan kurdên Botan û Badînan TENBÛRA KURDÎ (ne saza tirkî) bi kar tînin û distirin?!

(Hinermendê rastîn dikare pesna rewşa xwe, gelê xwe, sirûsta welatê xwe û tistên din bi muzîkê bide.) Bo nimûne, ku ew kî ye, çî dixwaze û hêviya gelê wî çî ye ??? Û hd. tê pir mixabin ku piraniya hinermendên me nikarin bi van tistên pîroz rabin û xizmeta hinera kurdî bikin. Çiku naxwazin notê fêr bibin. Da ku li ser wê biçin û awazên folklorî pê binvîsin û ji widabûnê biparêzin. Hindek hene ku notê dizanin. Lê xwe pê mijûl nakin û bi vî karê pîroz ranabin. Ji lewre yên ku notê dizanin yan jî nizanin nikarin xwe baş pêstixînin. Hema ji hinera wan diyar e, ku beî bingeş, dahênan, xebat û şîyan e. Ev jî ûştêk e ji ûştên paşxistina strana kurdî.

Bi rastî rêka pêşxistina hinera kurdî ne asan û hewente ye. Hema dirêj û pir zehmet e. Lê divê hinermendên me bi rêka nû gelek tîştan li ser muzîk û helbestan bixwînin. Hema di wê çaxê em dikarin texmîn bikin ku me dest bi pêşxistina hinerê kiriye. Li dawiyê em dikarin bêjin ku (Hinermendên zane bi xebata rastîn digihên hêviya xwe ya ji bo doza hinerê. Ji lewre jî divê em ji îro de destpêbikin.)

JI GELÎ HEVALAN RE
DÎWANA HELBESTVANÊ MEZIN **OSMAN SEBRÎ**
HATE ÇAPKIRIN!
DÎWANA HELBESTVANÊ NÎSTIMANPERWER
BIXWÎNIN Û BELAV BIKIN!

Dibistana

ARAM TÎGRAN

Ji bo fêrbûna muzîkê

Bernevkirina Beşîr Botanî



Dema notê 50% dirêjter dibe (1/2 dem bêitir) eger em xalekê (.) li nik notê deynin.

Nota تمام \circ

ser

Xal (.)

Nota تمام = 4 serbinser



\circ =  bin

Nota تمام bi xal $\circ.$ =

$\circ + \text{d}$

(nota تمام)(nîvnot)

= 4 serbinser + 2 serbinser

= 6 serbinser.



Nîvnot 

Xal (.)

Nîvnot = 2 serbinser

 = 

Nîvnot bi xal $\text{d}.$ =

$\text{d} + \text{d}$

(nîvnot)(çariknot)

= 2 serbinser+1 serbinser

= 3 serbinser




Bixwîne



Ta hejmar 4

CEJNA NEWROZA WE PÎROZ BE




Newroz bû agirêkî wehay xiste cergewe

Lawan be eşq eşûn be berew pîrî mergewe

Helbestvanê mezin

PÎREMÊRD



Stranên me yên folklorî bi dilên me ne. Di bîrên me de ne. Em ji wan pir hez dikin. Wek zarokên ku ji çîrokên xwe hez dikin. Em wan her dem dibihîzin û bi wan re dijîn. Da em wek gelên din biminin û ~~da em~~ bi serbilindî bijîn, divê em wan ji windabûnê biparêzin.

Xebata hinera folklorê kurdî dûr û dirêj e. Divê em bi hev re bixebitin û alîkariya hevdu bikin. Çûku hinera folklorê kurdî ne tenê ya min e, ya te ye, ya wan e, ya filan malbatê ye, ya filan eşîretê û ya filan rêxistinê û filan partiyê ye. Di vê em politîka eşîretî û malbatî bi kar neyînin. Çûku çî pêwendiya politîkayê, eşîret û malbatê bi folklorê re heye?! Her wisan divê em navê politîkayê, eşîret û malbatê ji bîr bikin û tev ji bo xizmeta hinera folklorê kurdî bixebitin.

KOVARA

MUZÎK Û HINER

BIXWÎNE Û BELAV BIKE

NEWROZ?!

Beşîr Botanî

Roja 21-ê Adarê cejna Newrozê ye. Newroz jî cejna gelên Îranê û Kurdistanê ye. Dîroka Newrozê gelekî dûr û kevn e. Hindek texmîn dikin ku digihê bi qasî 2593 salan berî niha. Di wê rojê de mirovên hejar li dij sitemkaran serketibûn. Ji lew re em dikarin bêjin, ku Newroz cejna serketin, azadî, astî û wekhevîyê ye.

Dibêjin ku şahek hebû, navê wî Dehak bû. Ew jî mirovekî sitemkar, xwînmêj û xwînrêj bû. Di wê çaxê de mirovên bindest tev bûne yek, bi serketî û pêşengiya KAWÊ (Kaweyê hesinger). Paşê bi xebata dirêj û nihênî şîyan, ku bigehin hêviya xwe û Dehakê sitemkar bikujin.



Hema ji wê rojê ta niha, gelên Îranê û Kurdistanê (Bi taybetî gelê kurd) di 21-ê Adarê de li ser çiyayê û li destan agir vêdixin (dadidin) û şevên xwe bi muzîk, stran, sema, piyes û henekan ve geş û xweş dikin û dibihorînin.

Lê îro emperyalistên xwînmêj, misilmanên sitemkar û dijminên gelên Îranê û Kurdistanê nahêlin ku mirovên astîxwaz, azadîxwaz û sitembar her sal di wê rojê de bi xwesî û dilşadî Newrozê pîroz bikin. Çi ku Newroz roja bîranîna azadiyê ye. Gelên me jî sitembar in û azadiyê dixwazin. Ji lew re dijminên sitemkar cejna Newroza pîroz qedexe kirine.

Her bijî Newroz! Her bijî xebata gelên bindest ji bo azadiyê! Her bijî xebat û tevgera Kurd, Ermenî û Asûrî ya ji bo welatekî serbixwe! Her bijî muzîk û evîn! Neman û mirin bo dîne Îslam û vegirkeran!

- KOSKA WÊNE -

Ji kovara Muzîk û Hiner re....Diyarî
û xelatên zarokên Kurdan yê ku li
derveyî welat dijîn.



Bêrivan Kalil

MIHEMED ARIF CIZÎRÎ

Şevên Kurdistanê ronahî dibin
 Gelên Kurdistanê bi dil şahî dibin
 Biharên Kurdistanê pir xweş dibin
 Evîndarên Kurdistanê serxweş dibin
 Ji ber te ey Cizîrî, tu gewher î
 Tu mîr î, tu sîmbola hiner î
 Cizîrî tu beşekî ji dilxweşiya me yî û şahiya me yî
 Cizîrî tu beşekî ji evîna me yî û hêviya me yî
 Hinera te tim li bîra me ye
 Şahî û dilxweşiya te bihara me ye
 Tu nav canê me yî, tu nav, dilê me yî
 Tu dengê Kurdistana me yî, tu bibilê me yî
 Tu bi evîni distirî û dixwîni
 Dipeyivî û dikenî
 Kacê bistire, muzîk jî lêxe û bikene, nê jîn kurt e
 û em ne tiştekin bê te
 Ey Cizîrî, tu yî rêka evîn û hiner
 Hiner û evîna rast, her û her

Jîn e
 Evîn jîn e birin jîn e
 Mîrovê evîndar
 Mîrovê birîndar
 Bi evîn e


Jîn e
 Muzîk jîn e Helbest jîn e
 Mîrovê tenbûrvan
 Mîrovê helbestvan
 Bi evîn e

Jîn e
 Bilbil jîn e Kevok jîn e
 Dengê bilbilê me
 Nav can û dilê me
 Bi evîn e

song

Jîne jîne jîne jîne evîn jîne birin jîne
 Mi-ro-vê e - vîn - gar mi-ro-vê bi - rîn - gar
 Bi e - vî - ne bi e - vî - ne bi e - vî - ne bi e - vî - ne

music



Bestir

SIPAS!

Kovara Muzîk û Hiner, hizir û rêka çapkîrîna wê û di gel karê nîştimanperweriya xwe em gelekî şad kirine. Berhevkin, çapkin û belavkirina hinera kurdî zor giring û pêwîst e. Ji ber ku ew roj bi roj têtê ji bîr kirin û windadibin. Em pêşveçûn û serketineke baş ji we re dixwazin.

Nûra Cewarî-Ermenistan
Dr.di hinera kurdî de

Min ji kurdiya te ya bedew, ji helbestên te yê ciwan pir hez kir. Hêvîdar im, ku domî nivîsandinê bikî. Hinera xwe pêşdetir bibî. Dilxweşî û serfiraziya te dixwazim. Silavên germ pêşkêş dikim.

Kendal-Ferensa
Rojnamevan

Min pirtûka we (Aştî û Evîn) û kovara we (Muzîk û Hiner) xwend. Bi rastî pir bi dilê min bûn. Pir sipas ji bo karê baş. Ez pêşketin û serketin ji we re dixwazim.

Temo-Ferensa
Tenbûyan, awazvan û stranbêj

Kovara we Muzîk û Hiner mizgîniyeke gelek baş e. Pirtûka we Aştî evîn hêviya me ye. Her wisan em hêvîdar in, ku hûn bi hinera kurdî rêka me ronahî bikin.

Gulê Hekarî-Libnan
Karker

Her wisan Kovara Muzîk û Hiner pir sipasê hevalan, bi taybetî yê ku pere û alîkarî ji bo kovarê şandine. Wek (Hoşîn Osman Sebrî-Swêd, Cano Azadyan-Elmanya, Kirîf Xaçatûryan-Yewnanistan, Sêvê Keko-Ermenistan, Zarîk Simûnyan-Ermenistan, Mixo Metî-Swêd, Aram Vahakyan-Libnan, Bavê Aşûr-Kanada, ji hevalekî bê nav-Sûrî û Metî Tomas-Urdin.

Kovara

Muzîk û Hiner

bixwîne û belav bike!


NÛÇEYÊN HINERÊ

Tîgran Sîmonyán

Kurdîstana Îranê

Rojekê pêşmergeyek ji pêşmergeên Kurdîstana Îranê hate Swêdê. Li rewşa Kurdîstana Îranê kad kir û got:- Di sala 1960-î de 10 000 kurd martir bûne (şehîd bûne) û sîtema Xumeynî li dijî hejaran roj bi roj xurtir dibe. Rejîma Îranê nikare ku şoreşa me vemirîne û vîna gelê kurd bipercîqîne. Ji ber vê jî kurdên me nêzîkî 100 000 Km² ji xaka Kurdîstanê rizgar kirine û tevî cihên girîng xistine jêr destên pêşmergeên dilsoz. Çekên wan jî gelekî û bi lehengî şerê xwe li dijî emperyalîzmê dikin. Her wisan got:- (Rewşa welat ji dema sahê Îranê xirabtir e. Muzîk, sema, tiyatro û tevî her texlîf hiner hatin qedexe kirin.)

Zanîn geh û dibistan hatin girtin û bi tenê kovarek li Îranê derdikeve. Ew jî kovara Benî Sedir e Xwendevanên delal û hêja, kovara " Muzîk û Hiner " pir sipasî pêşmergeê welat dike. Çûku di dîroka Kurdîstanê de ji muzîkê her ne hatiye kad kirin. Ev jî cara yekemîn bû ku em dibihîzin.



Hinermendê RASTÎN dikare pesna rewşa xwe,
gelê xwe, sirûsta welatê xwe û tistên din
bi MUZÎKÊ bide.

Hinermendên ZANE bi XEBATA RASTÎN digihên
HÊVIYA xwe ya ji bo DOZA HINERÊ. Ji lew re
jî divê em jî firo de DESTPÊBIKIN

DIVÊ hinermendê zane hinera gelê xwe ji ne-
MANÊ biparêze. Bi HELBEST û AWAZA stranê
NELÎZE û NEGUHIRE.

Yê ku bixwaze jîna xwe PÊSBIXÎNE
Divê muzîkê BIXWÎNE

Jîna mirov bi muzîkê JÎN e
Laşê wî jî her dem bi EVÎN e

Mirovê jîr, ji muzîkê re TÎ ye. Çiku muzîk
JÎN e û jîna bê MUSÎK, wek ERDÊ bê AV e.

Jîn bi hinerê RENGÎN dibe. Ciwanî û xweşiya
wê MUZÎK e.

Beşîr Botanî

JI BO ALÎKARIYÊ POSTGIRCKONTO 453 46 47-5
BASHIR BOTANI SWEDEN